Mukaddime, 17/1 (Mayıs 2026), 247-266
Araştırma Makalesi

Mardin Artuklu Üniversitesi
Mukaddime

# Kürtçe İki Çocuk Kitabının Ekoeleştiri Kuramı ve Çevre Eğitimi Açısından İncelenmesi

Ferhat Çiftçi

ORCID: 0000-0003-4117-2477 | E-Mail: ferhatciftci1@gmail.com

Dr. Öğr. Üyesi, Muş Alparslan Üniversitesi, Sağlık Hizmetleri MYO, Çocuk Bakımı ve Gençlik Hizmetleri Bölümü

ROR ID: https://ror.org/009axq942

**Öz**

Çocuk edebiyatı kapsamında bazı kitaplar doğa ve çevre sevgisi, bilinci ve bunları korumayı konu edinir. Bu kitaplar, okuyucularına doğa ve çevrenin içinde olduğu halleri ve bu yönde bazı tehlikeleri yansıtan bir role sahiptir. Doğa ve çevre bilinci de çocuk edebiyatında önemli bir tema olarak dikkat çeker. Edebi kuramlardan Ekoeleştiri ve eğitim alanında çevre eğitimi bu yönde bazı özelliklere sahiptir. Bu çalışma, Kürtçe iki çocuk kitabını ekoeleştiri kuramı ve çevre eğitimi açısından incelemektedir. Örnek kitaplar Berfin Ayşe Öğüt'e ait *Dara Pîroz* (Kutlu Ağaç) ve Îsmaîl Dîndar'a ait *Warê Leglegan*'dır (Leyleklerin Yurdu). Birincisi çocuklar için resimli öykü, diğeri ise roman olarak kaleme alınmıştır. Çalışmanın amacı, ilgili kitapların ekoeleştiri kuramı ve çevre eğitimi açısından hangi karşılıklara sahip olduğunun incelenmesidir. Bu çalışmada doküman analizi ve bulgulara erişmek için içerik analizi yöntemlerine başvurulmuştur. Çalışmanın sonucunda bu kitapların temaları ve içeriklerinin doğa sevgisi, bilinci ve onu koruma üzerine olduğu; bu çerçevede bazı özellikler taşıdıklarına ulaşılmıştır. Ekoelşetiri kuramı ve çevre eğitimiyle örnek kitapların içerik ve özelliklerinin denkleştiği görülmüştür. Buna göre örnek kitaplar "doğa ve çevre ile bir ve birlikte olma; onları tanıma, keşfetme ve fark etme; sevme; bilincine varma; fayda ve zorlukları; ona yönelik tehlikeler; koruma, bunun için harekete geçme ve girişimcilik gösterme vb. unsurlara göre incelenmiş ve yorumlanmıştır. Dolayısıyla bu çalışmanın çocuk edebiyatı alanında doğa ve çevre sevgisi, bilinci ve bunları korumaya yönelik ailelere, eğitim çalışanlarına ve uzmanlara rehberlik edebileceği beklenmektedir.

**Anahtar Kelimeler**: Ekoeleştiri Kuramı, Çevre Eğitimi, Doğa, Dara Pîroz, Warê Leglegan.

**Atıf Bilgisi (APA 6):**

Çiftçi, F. (2026). Nirxandina Du Pirtûkên Kurdî yên ji bo Zarokan li gorî Teoriya Ekorexneyê û Perwerdeya Hawirdorê. *Mukaddime, 17(1),* 247-266. https://doi.org/10.19059/mukaddime.1837078

Makale Geliş Tarihi: 06.12.2025
Makale Kabul Tarihi: 02.03.2026

# An Eco-Critical Analysis of Two Children's Books in Kurdish from the Perspective of Environmental Education

Ferhat Çiftçi

ORCID: 0000-0003-4117-2477 | E-Mail: ferhatciftci1@gmail.com

Assist. Prof., Muş Alparslan University, Vocational School of Health Services, Childcare and Youth Services Department

ROR ID: https://ror.org/009axq942

**Abstract**

Within children's literature, some books address themes related to the love of nature, environmental awareness, and the protection of the natural world. These books play a role in reflecting the state of nature and the environment, as well as the dangers and threats they face, to readers. Nature and environmental awareness are therefore significant themes in children's literature. In this regard, ecocriticism within literary theory and environmental education within the field of education offer important conceptual frameworks. This study examines two Kurdish children's books through the lenses of ecocriticism and environmental education. The sample texts are Dara Pîroz (The Blessed Tree) by Berfin Ayşe Öğüt and Warê Leglegan (The Land of Storks) by Îsmaîl Dîndar. The former is an illustrated storybook for children, while the latter is a novel. The aim of the study is to explore how these books correspond to the principles of ecocriticism and environmental education. Document analysis and content analysis methods were used to obtain the findings. The results revealed that the themes and content of the books center on love for nature, environmental awareness, and environmental protection; within this framework, the books exhibit specific characteristics. It was observed that the content and features of the sample books align with ecocriticism and environmental education. Accordingly, the books were examined and interpreted based on elements such as "being one with nature and the environment; recognizing, discovering, and noticing them; loving and appreciating them; understanding their benefits, harms, and dangers; protecting them; taking action; and demonstrating initiative." Therefore, this study is expected to guide families, educators, and experts in children's literature in fostering love for nature, environmental awareness, and environmental protection.

**Keywords:** Ecocriticism Theory, Environmental Education, Nature, Dara Pîroz, Warê Leglegan.

**Citation (APA 6):**

Çiftçi, F. (2026). Nirxandina Du Pirtûkên Kurdî yên ji bo Zarokan li gorî Teoriya Ekorexneyê û Perwerdeya Hawirdorê. *Mukaddime, 17(1),* 247-266. https://doi.org/10.19059/mukaddime.1837078

Article Date of Submission: 06.12.2025
Article Date of Acceptance: 02.03.2026

# Nirxandina Du Pirtûkên Kurdî yên ji bo Zarokan li gorî Teoriya Ekorexneyê û Perwerdeya Hawirdorê

**Kurte**

Hin pirtûkên zarokan di nav edebiyata zarokan de li ser hezkirin, hişmendî û parastina xweza û hawirdorê radiwestin. Ev pirtûk ji xwînerên xwe re wekî navbeynkarekê şert û mercên xweza û hawirdorê û xetereyên wê bi vî awayî pêşkeş dikin. Hişmendiya xweza û hawirdorê jî di edebiyata zarokan de wekî temayeke berpêş balê dikişîne. Di teoriyên edebî de ekorexne û di qada perwerdeyê de perwerdeya hawirdorê bi vî rengî hin taybetiyan dihewînin. Ev vekolîn li ser du pirtûkên kurdî yên ji bo zarokan disekine û nirxandinekê li ser teoriya ekorexne û perwerdeya hawirdorê pêşkêş dike. Pirtûkên mînak, berhema Berfin Ayşe Öğüt a bi navê *Dara Pîroz* û ya Îsmaîl Dîndar a bi navê *Warê Leglegan* in. A yekem wekî çîroka biwêne ya duyem jî wekî roman hatiye nivîsîn. Amanca vekolînê nirxandina pirtûkên berbehs e ji aliyê teoriya ekorexne û perwerdeya hawirdorê ve. Ev xebat, li ser bingeha "Di van pirtûkan de hewandina hêmanên ekorexne û perwerdeya hawirdorê çawa ye?" hatiye avakirin. Di vê xebatê de rêbaza analîza dokumanî û ji bo destkeftiyan jî analîza naverokî hatiye bikaranîn. Di encama lêkolînê de hatiye dîtin ku tema û naverokên van pirtûkên mînak li ser hezkirin, hişmendî û parastina xwezayê ne; di vê çarçoveyê de hin taybetmendiyan dihewînin. Wate, hatiye dîtin ku teoriya ekorexneyê û perwerdehiya hawirdorê bi taybetî û naverokên pirtûkên mînak re hinkûf in. Bi vî awayî pirtûkên mînak li gorî hêmanên "ji bo bihevrebûn û yekbûna digel xweza û hawirdorê; naskirina wan, hayjêhebûn û kifşkirin; hezkirin; hişmendî; feyde û zehmetiyên wan; xetereyên li hemberî wan; parastina wan, tevger û nîşandana peyankeriyê ji bo wan, hatine nirxandin û şirovekirin. Loma ev xebat, di qada edebiyata zarokan de ji bo hezkirin, hişmendî û parastina xweza û hawirdorê dikare ji malbat, berpirsiyariyên perwerdeyê û pisporan re bibe rênîşandanek.

**Peyvên Sereke:** Ekorexne, Perwerdeya Hawirdorê, Xweza, Dara Pîroz, Warê Leglegan.

**Agahîya Referansê (APA 6):**

Çiftçi, F. (2026). Nirxandina Du Pirtûkên Kurdî yên ji bo Zarokan li gorî Teoriya Ekorexneyê û Perwerdeya Hawirdorê. *Mukaddime, 17(1),* 1-25.
https://doi.org/

Dema Hatina Gotarê: 06.12.2025
Dema Pejirandina Gotarê: 02.03.2026

**Destpêk**

Dinya û jiyan ji bo zindiyan du hêmanên şirîk in. Herçiqas meriv, wekî navend ji xwe re cihekî bibîne jî ji ber sedemên şirîkatiya berbehs hin berpirsiyariyên wî hene; di nav jiyanê de tenê meriv tune ye û ew bi zindî û hebûnên din re rû bi rû ye. Meriv bi aqil û karînên xwe di alema hebûnê de wekî berpêş bixuyê jî li hemberî şert û mercên jiyanê ev rola wî ya pêşeng dikeve çarçoveya hevpariyê. Kirdeyatiya wî heye lê pêwîst e ku ew digel hebûnên din di nav hevsengiyekê de bijî. Loma dikare bê gotin ku meriv hem berpirsiyarê xwe û civatê ye hem jî yê ajel û xwezayê ye û di navbera van de hevbandoriyek heye. Ev yek xaleke gelekî giring e ku nabe were piştguhkirin. Çimkî berdewamiya jiyaneke saxî û ewlehî girêdayî hawirdoreke paqij û xerabnebûyî ye. Paşeroja dinyayê heta niha çawa bi awayekî hatiyê îro, divê dîsa bi vî awayî bigihîje pêşerojê jî.

Li gorî Yazgünoğlu, tenê çîroka însaniyetiyê tune ye, ya xwezayê û dinyayên din jî heye (2024, r. 352). Ji ber vê yekê zindîtî ne tenê ji bo merivan e, ji bo zindiyên ji xeynî wan e jî û divê di nevbera meriv û dinyayên din de têkiliyek çêbibe. Herçiqas meriv beşdarî jiyana zindiyan a giring bibe jî ev taybetî ji aliyê din ve hin pirsgirêk derxistine holê. Pirsgirêkên ku jiyanê bi awayên cur bi cur xerab dikin, tê zanîn ku bêtir bi destên merivan pêk tên. Xerabkirina xweza û hawirdorê bi vî awayî pirsgirêkeke balkeş e û ji bo parastina wê jî digel fikr û ramanan hin tevgerên cihêreng pêk hatine. Bi gotina Mamur, di sedsala 20em de civaka modern, aborî û zîhniyeta pêşketinê, dinya xistiye nav qrîzekê û ji ber sedema wan di qada hunerê de tevgerên hawirdorê derketine holê (2017, r. 1001). Bi gotineke din, li derdora têkiliya meriv û hawirdorê li ser hêmanên modernîte, kapîtalîzm, mêtinkarî, bajar, desthilatî, polîtîka, zayendên civakî, netew, kom û polên civakî û hwd. hin nêzikatî û fikr û raman pêk hatine (Yazgünoğlu, 2024, r. 351).

Dikare bê gotin ku di binyada fikr û raman û tevgerên li ser xweza û hawirdorê de hişmendiya meriv û li ser vê yekê jî parastina xweza û hawirdorê heye. Li vir fokûs li ser xweza û hawirdorê ye lê pîvan li ser merivan e. Ji ber ku meriv cihekî giring werdigire ku hem sedema xerabbûna dinyayê û hawirdorê hem jî avakerê wan tê hesibandin. Çawa ku di têkiliya meriv û xwezayê de mirovî zerar daye xwezayê û ev yek ji destê merivan hatiye holê, dîsa awer ji destê merivan digel perwerdeya hawirdorê ve ev xerabî divê bê rastkirin (Özdemir, 2005, r. 25). Ev yek nîşan dide ku di nav her fikr û raman û tevgerên cur bi cur de hin derfet û astengî hene. Her wiha geşedana teorî û cudabûn û balkêşiya wan jî bi awayekî ji têgihiştin û çareseriyên ku pêşkeş dikin tê. Hezkirin, hişmendî, parastina xweza û perwerdeya hawirdorê û hwd. di eslê xwe de girêdayî hev in û di qadên cihêreng de xwedî bandoreke hevpar in. Loma di hêmanên rêzkirî de bergeh, bi şêweya navdîsîplînî ye.

Hişmendî, parastin û perwerdeya hawirdorê digel hin çarçoveyên têkildar dikarin bên nirxandin. Di qada vekolîn û hilberînên hunerî de tê dîtin ku van salên dawî rêya hişmendiya hawirdorê û ya hunerê li hev hatiye û di berhemên hunermendan de parastina hawirdorê pêkan bûye (Mamur, 2017, r. 1001). Mijar û temayên xweza û hawirdorê û sedemên xerabî û parastina wan bi awayekî normal dikeve çarçoveya ekorexneyê. Ev nêzîkatî, li ser berheman li gorî taybetiyên xweza û hawirdorê gavên xwe diavêje û nirxandineke bi vî awayî pêşkeş dike. Li gorî fikriyata ekorexneyê divê edebiyat li nik merivan xwebûneke ekolojîk pêk bîne ku ev yek ji binyada berpirsiyar a edebiyatê û bandora edebiyatê tê ku li ser merivan e (Yavuz, 2019, r. 247). Hunera edebiyatê û bi taybetî edebiyata zarokan li vir li gorî roleke jiyanbar digihîje wateyekê. Perwerde jî li gorî pencereya xwe bi vî awayî xwedî olan e.

Ev xebat, nirxandina du pirtûkên kurdî yên ji bo zarokan li gorî teoriya ekorexneyê û perwerdeya hawirdorê amanc dike. Bi vî awayî di nîskoka xebatê de, naverokên pirtûkên mînak ên ku li ser xweza û hawirdorê ne, cih girtine. Ev herdu kitêbên kurdî yên ji bo zarokan li gorî nêzîkatiya hezkirin, hişmendî û parastina xweza û hawirdorê hatine pêşkeşkirin.

**1. Teoriya Ekorexneyê**

Li gorî veguhestinên Bulut Sarıkaya, ekorexne wekî rexneyeke edebî di sala 1978ê de tê holê û cara yekem ji aliyê William Ruekert ve wekî "lêanîneke prensîbên ekolojiyê ji edebiyatê re" tê pênasekirin. Dîsa Cheryll Glotfelty jî pêşengeke vê teoriyê tê qebûlkirin û li gorî wê jî ekorexne wekî "nirxandina têkiliya navbera edebiyat û hawirdora fîzîkî" ye. Vekoler li ser vê yekê dibêje ku di navenda vê teoriyê de ne meriv, hawirdor heye (2005, r. 80). Hunermendên ku di nav berhemên xwe de cih didin pirsgirêkên xwezayê, digel derfetên edebiyatê pirsgirêkên ekolojiyê rexne dikin û bi vî awayî hem di merivan de hişmendiyeke xwezayî pêk tînin hem jî banga jiyaneke hevseng û biaheng a digel xwezayê dikin (Bulut, 2020, r. 627). Ji van agahiyan tê fahmkirin ku xweza di nav edebiyatê de digel teoriya ekorexneyê, li gorî nêzîkatiya kevneşopî êdî bi awayekî taybet tê dîtin.

Ekorexne ku li ser bikaranîna mijarên ekolojîk û sembolên têkildarî xwezayê ya di berhemên edebî de disekine, ji zanistên xwezayî yên wekî biyolojî, jeolojî û fîzîk û her wiha zanistên civakî sûd werdigire û têgehên ku ji hêla van zanistan ve hatine pêşxistin bikar tîne (Oppermann, 1999, r. 29). Qadeke navdîsîplînî ya ekorexneyê, nirxandina şewqdana xwezayî ya ji edebiyatê ye û di heman demê de xwîneran nêzîkî teşwîqa hevbandorekê dike (Bulut Sarıkaya, 2005, r. 79). Ji ber vê yekê mentiq û derdora wê ji giringiya xwezayê û lêxwedîderketina hawirdorê şikil werdigire. Giringiya ekorexneyê jî di edebiyatê de ji karîna ravekirina têkiliyên alozî yên ku di navbera xweza û edebiyatê de ne tên (Ismail, 2024, r. 145). Rûpelên edebiyatê bi vî awayî dibe fêrgeha xwezayê û parêzgeha hawirdorê. Gelek nivîskaran di serdema pêşketina jiyana zarokan de bandorek li ser hişmendiya parastina hawirdorê kirine (Mishra, 2016, r. 91).

Amanca ekolojî û ekorexneyê ev e ku beşdarî parastin û domandina jiyana mirovan bibin (Tošić, 2006, r. 43). Herçiqas amancên ekorexneyê li ser nirxandina hişmendî û parastina hawirdorê şênber bibin jî wekî têkiliya huner û nêzîkatiyên din jî taybetiya estetikê ji xwe hertim heye. Ji ber ku her berhema edebî li ser kerese, tema û mijarên xwe pêk tê û qîmeta xwe jî ji taybetiya xwe ya xweser û estetîkê werdigire. Ekorexne, xwezayê ne wekî fonekê bi kar tîne, wê wekî pariyeke metnê ya ne cudaker dibîne (Topal, 2025, r. 33). Ev yek lihevgirtineke giring e ku mesnedî piralîbûnê ve tê. Ji ber ku edebiyat tenê li ser hêlekê nayê sînordarkirin li ser berhem û mijarên edebiyatê rolên takekesî û civakî diyar in. Loma em dikarin hem ji aliyê takekesî hem jî ji aliyê civakî ve qala xwezayê bikin ku ev jî bi vî awayî dibe hevparê edebiyatê.

Xetereya dîdaktîzmê di edebiyatê de mijareke domdar e. Berhem carna li gorî vê yekê tên rexnekirin. Di eslê xwe de her berhem xwediyê peyamekê ye. Huner ev e ku berhemek peyamên xwe bi awayekî rasterast pêşkeş neke û qîmeta xwe kêm neke. Bi piranî edebiyata zarokan bêpedagojî nayê fikirîn. Lê ev yek encax tevî hêmanên estetîkê digihîje mentiqekê. Loma meriv dikare hêmanên hezkirin, hişmendî û parastina xweza û hawirdorê bi awayekî hevseng hem di qada didaktikê de hem jî di ya estetîkê de bibîne.

## 2. Perwerdeya Hawirdorê

Mijar û kereseyên perwerdeyê bi awayekî siruştî girêdayî jiyanê ne. Jiyana meriv wekî cihên bingehîn, olanên dinyayê û xwezayê dihewîne. Rûdan û rewşên ku di nav jiyanê de tên jiyîn, bi wî awayî carna li ser agahî, zanîn û pênaseyên xweza û derdora meriv şikil werdigirin. Perwerdeya hawirdorê di eslê xwe de qadeke hînker a wekî jiyanbar û bi tecrûbe ye û hewce ye ku li ser pêvajoyeke karînên zanistî, hestî û psîkomotor û pêkanên kifşkirin û afirînî be (Gülersoy û yd. 2020, r. 2385). Ev tesbît jî nîşan dide ku perwerdeya hawirdorê ji bo zarokan ji aliyê geşedana wan ve xwedî bandoreke berfireh e. Ji ber ku hem hêmana perwerdeyê li ser têgihiştinên xwe bi rêk û pêk dibe hem jî xweza û hawirdor wate û naverokên cur bi cur dihewînin. Ji gotina Özdemir jî diyar e ku rê û rêbazên perwerdeya hawirdorê gelekî berfireh in û ji wan yek navenda navdîsîplînî ye ku bi navbeynkariya dîsîplînên cur bi cur derfet û bandorên cihêreng pêk tên (2005, r. 36).

Digel veguhestinên Akçay, parastina hawirdorê cara yekem di sala 1970yî de di “Roja Dinyayê” de hatiye plansaziyê û di sala 1972yê de li Stockholmê di civîna “Hawirdora Însên” de ji aliyê NYyê ve li hemberî zêdebûna pirsgirêkên hawirdorê ji bo hevgiriya hemû dewletan hatiye lidarxistin. Dîsa li gorî veguhestina vê vekolerê, piştî vê yekê Bernameya Hawirdorê ya NYyê û Bernameya Perwerdeyê ya Hawirdora Nawneteweyî hatine pêşkeşkirin û li pey van jî çend konferans û rapor û hwd. hatine holê. Niha jî ji bo perwerdeya hawirdorê li welatên cur bi cur ên rojavayî, fêrgehên fermî û yên taybet û her wiha di bin warê NYyê de mezringehên navneteweyî yên wekî UNESCOyê hene û xebatên ji bo vê yekê dikin (2006, rr. 16, 21).

Giringiya perwerdeyê ji bidestxistina pêkanîna berdewamiya jiyanê, parastina hevseng a ekolojîk û ji qezençkirina agahî, karîn û nirxan a ji bo parastina hawirdorê tê (Özdemir & Gökçe, 2019, r. 63). Li gorî Erten jî hişmendiya hawirdorê dikare wekî agahiya hawirdorê, helwesta hawirdorê û tevgerên bifeyde yên hawirdorê bi sê xalan bê nîşandan (2004, r. 4). Loma perwerdeya hawirdorê ne wekî temamkirineke ast û serdemekê ye, beravajî wê, perwerdeyeke domdar û piralî ye û dikare bê gotin ku hişmendiyeke takekesî û civakî ye. Bi gotina Bahar û Kiras, di van salên dawî de xebatên cur bi cur ên li ser perwerdeya hawirdorê zêde bûne û ev xebatên berbehs bi piranî li ser hêmanên wekî “helwest û tevgera hawirdorê, perwerdeya hawirdorê, agahiya hawirdorê û pirsgirêkên hawirdorê” rawestine û di nav amancên wan de hişmendiya hawirdorê û berpirsiyariya takekesî û civakî balê dikişîne (2017, rr. 1714-1715). Piştî van xisûsan dikare bê gotin ku perwerdeya hawirdorê bi fêrbûneke piralî ve piştgiriya zarokan dike. Di navbera xweza, hawirdor û zarokan de bi awayekî erênî hevbandoriyekê tîne holê.

Perwerdeya hawirdorê nabe ku tenê li ser dibistan û fêrgahan bê dayîn, divê malbat, dibistan û mixatabên derdorê, berpirsiyarên hevpar ên vî karî bin. Di hişmendî û perwerdeya hawirdorê de dorhêla yekem malbat e û pişt re dorhêla fêrgehê tê (Yücel & Morgül, 1999, r. 88). Perwerdeya hawirdorê çiqas ji salên zûtir dest pê bike ewqas baş e ku hezkirina xwezayê û rûmetdayîna wê û geşadana hestiyariya empatiyê ji vê yekê pêk tên (Erten, 2004, rr. 3-4). Li gorî van tesbîtan giringiya mal û malbatê di perwerdeya zarokan de xwedî roleke pêşeng e. Em dikarin bêjin kesayetên ku li derdora zarokan in, di nav civatê jî de ne loma jî wekî rol modelên zarokan in. Lê belê cihê perwerdeya formel dibistan û fêrgeh in û ev cih perwerdeyê bi awayekî planker li ser hin bername û pêvajoyên hînker didin; ji ber ku di perwerdeya hawirdorê de bernameyên alternatîf û çalakiyên cur bi cur ên ku têkiliya hawirdor û qadên din nîşan didin, xwedî derfet in (Şimşekli, 2004, r. 92). Eger perwerdeyeke hawirdorê a domdar û bibandor tê amanckirin

divê temayên ku bala zarokan bikişînin bên hilbijartin û ev jî bi çalakiyên cur bi cur bên spartin (Şimşekli, 2004, r. 91). Bi vî awayî heger perwerdeya hawirdorê digel piştgiriya herdu fokûsên wekî malbat û kesên hawirdorê bê dayîn û temsilkirin, dikare bê gotin ku digel plansaziyên dibistanan ve digihîje serkeftiyekê.

### 3. Têkiliya Xweza, Hawirdor û Edebiyata Zarokan

Hezkirin, hişmendî, parastin û perwerdeya hawirdorê ya di qada edebiyatê de ji aliyekî ve dikare li ser edebiyata zarokan jî bê şopandin. Rêyeke perwerdeyê ya hawirdorê digel pêwendiya navzanistiyê, edebiyat e (Kiziroğlu, 2023, r. 9). Feydeyên edebiyata zarokan ji zarokan re cur bi cur in. Zarok digel navbeynkariya xwendina pirtûkan û çalakiyên ku bi vê rêyê dikin, dibin xwedî hin derfetan û li ser vê yekê digihîjin geşedanekê. Yek ji van derfet û qezencên ku bi vî awayî zarok dibînin ev e ku bi saya pirtûkan hezkirina xweza û hişmendiya parastinê pêk bên. Hin pirtûkên zarokan li ser vê amancê, xweza û hezkiran û parastina wê wekî tema û mijar bi kar anîne. Li ser têkiliya hawirdor û edebiyata zarokan Teke û Baş, bal kişandine ku edebiyat, bi vî rengî wekî navbeynkarekê ye ku merivan ji aliyê tunekirina neyîniyên ku ji destên merivan tê diparêze û derfetên guherîn û veguherînan pêk tîne (2021, r. 135).

Metnên hawirdorê yên ji bo zarokan, rojevên dinyayê yên guherbar ji wan re pêşkeş dikin û pêşbîniya îxtîmalên pêşerojê dikin (Massey & Bradford, r. 2011, r. 109). Ev yek, di nav rolên edebiyata zarokan de ji me re karînên rojevê û amadekariya pêşerojê nîşan dike. Ji ber ku têgihiştin û şopandina guherîna dinya û jiyanê bala zarokan dide ber hin pirsgirêk û rewşên îroyîn ên derheqê xwezayê. Lêbelê dikare bê gotin ku balkişandina zarokan a xweza û hişmendiya hawirdorê ji aliyekî ve ji xeynî hezkiriyên zarokan dimînin. Ji ber ku zarok ji lîstik, kêf û henek û mijarên mîzahî hez dikin. Li gorî Massey û Bradford, di navbera zanista hawirdorê û tecrûbeya jiyan û geşedana famkirina zarokên piçûk de vezalaneke xurt heye (2011, r. 126). Wê çaxê pirseke weha tê holê ku divê bê bersivandin. Pirs ev e: “Gelo dê zarok hema wiha bimînin û qet mezin nebin?” Loma mijar û temayên wekî pirsgirêkan an jî yên civakî û polîtîk encax bi şerheke pêwendî zimanê zarokan, bi bergehên wan û li gorî prensîbên edebiyata zarokan ji xwe re cihekî dibinin. Eger wisa nebe zarok tenê di nav asteke parêzker û pir bitaybet de dimînin û ji rastî û hewceyên xwe dûr dikevin. Ev, ji aliyê kesayetî û geşedana wan ve zirarê dide wan. Yanî herdu hêl jî avakerên edebiyata zarokan in. Edebiyata zarokan bi vî awayî ji bo zarokan di nav serdeman de berhemên xwe bi cih dike û ev yek di heman demê de pedagojîk e. Rêya edebiyata zarokan û ya perwerdeyê di eslê xwe de li gorî mixatabê xwe yên zarok bi siruştî li hev tên. Dibe ku edebiyat hinekî ji derdora perwerdeyê yan jî rola fonksiyonê ve bê dûrxistin. Ev yek rast e lê rastbûneke din jî ev e ku edebiyat di xwîneran de hin guherîn û hişmendiyan pêk tîne. Ji bo zarakon jî ev derbasdareke xurt e û loma têkiliya edebiyat û perwerdeyê ji hev venaqete.

Hişmendî, hezkirin û parastina hawirdorê di pirtûkên zarokan de digel hemû cureyan xwe nîşan dide. Şopên bihîstin, zanîn, hezkirin, parastinên xweza û hawirdorê li gorî fokûsên cihêreng dikarin bên dîtin. Wekî mînak bikaranîna niştiman, bajar, gund û ajel û giya, bi awayekî dikeve çarçoveya hezkirin, hişmendî û parastina xweza û hawirdorê. Ev hem di berhemên edebiyata zarokan ên kevin de hem jî di yên modern de xuya ne. Lê hişmendî, parastin û hezkirana xweza û hawirdorê wekî hin temayên din di edebiyata zarokan de mijarên taybet in û bêtir digel têkiliya hawirdor û merivan wekî berîdaniyeke xurt e. Ji ber ku gelek pirtûkên zarokan li ser mijarên hevaltî û têkiliya ajel û hêmanên din ên xwezayê, pênaseya wan û bihîstina zindiyan yan jî wekî pirsgirêkên

ciwakî guherîna avûhewa, kirêjkirina hawirdor, tunekirina cihên wekî park û hêşinayî û zêdebûna betonbûne ne.

**4. Rêbaz**

Ev xebat, wekî analîza dokumanî hatiye avakirin. Di bin vê rêbazê de ji bo bidestxistina destkeftiyan analîza naverokî hatiye bikaranîn. Ji bo vê yekê berê pirtûkên mînak hatine diyarkirin ku naverokên wan li ser temayên hezkirin, hişmendî û parastina xwezayê ne. Ev hersê hêman, di nav feydeyên pirtûkên zarokan ên ku li ser xweza û hawirdorê ne de derbas dibin (Teke & Baş, 2021, r. 137). Pirtûkên kurdî yên ji bo zarokan ên ku hatine analîzkirin ev in: *Dara Pîroz* û *Warê Leglegan*. Bi vî awayî pirtûkên hilbijartî hatine xwendin û di heman demê de di naverokên wan de diyardeyên ku dikevin çarçoveya perwerdeya hawirdorê û têkildarî ekorexneyê dibin, hatine nîşankirin. Li gorî taybetiyên xwe destkeftiyên xebatê di bin sernavên guncav de bi têkiliyên xweza, hawirdor û ajelan ve wekî kodên wiha hatine rêzkirin: "Bihevrebûn û yekbûn; naskirina wan, hayjêhebûn û kifşkirin; hezkirin; têgihiştin/hişmendî; zanîna feydeyan; zanîna dijwariyan; xetereyên li ser wan; parastin, tevger û nîşandana peyankeriyê ji bo wan; rewşa mexdûr û yên din. Herdu pirtûkên mînak digel iqtîbasên rasterast ên ku destkeftiyan şênber dikin hatine pêşkeşkirin û şirovekirin.

**5. Dara Pîroz û Warê Leglegan li gorî Ekorexneyê û Perwerdeya Hawirdorê**

Di vê xebatê de pirtûkên mînak, berhema Berfin Ayşe Öğüt a bi navê *Dara Pîroz* û ya Îsmaîl Dîndar a bi navê *Warê Leglegan* in. Herdu pirtûk jî digel mijarên xwe li ser hezkirin, têgihiştin/hişmendî û parastina xweza û hawirdorê radiwestin. *Dara Pîroz* wekî çîrok ji bo zarokên 10-12 saliyan, *Warê Leglegan* jî wekî roman ji bo zarokên 10 salî û zêdatiran, yanî ji bo nûciwanan hatiye diyarkirin. Pirtûka yekem, biwêne ye û bi 250 peyvan dikeve asta yekem û bi 14 puntoyan hatiye nivîsîn. Ya duyem jî bêwêne ye û bi 600 peyvan dikeve asta sêyem û bi 12 puntoyan hatiye nivîsîn. Ev ast, di bergên dawî de ji aliyê weşanxaneyê ve li gorî rewşa têgihiştina bêjeyên cur bi cur hatine nîşankirin. Dikare bê gotin ku ev pirtûkên mînak bi rêya edebiyatê ji zarokan re bi mijar, tema, serpêhatî û vegotinên xwe hişmendiyek amanc kirine.

Serpêhatiya pirtûka yekem a *Dara Pîroz*ê (Öğüt, 2020) bi kurtasî li ser nexweşiya serlehenga pirtûkê a bi navê Zeryayê derbas dibe. Ji bo lêgerîna dermanê nexweşiya Zeryayê digel hin jiyîn û rewş, dara pîroz digihîje wê û malbata wê. Bi vî awayî dara pîroz dibe dermanê serlehenga pirtûkê. Li ser vê serpêhatiyê di naveroka pirtûkê de xweza û hawirdor bi hişmendî, pênase, hezkirin û parastina wê ve tê dîtin.

Serpêhatiya pirtûka duyem a *Warê Leglegan* (Dîndar, 2020) li ser serlehenga pirtûkê Berfîn û birayê wî Mem derbas dibe. Di romanê de hezkirina xweza, jiyana xwezayî û xetereyên li ser xwezayê şop bi şop hatiye honandin. Bi devê Berfînê, du gundên wan ên girêdayî Amedê û derdora wan bi xweza û jiyîna xwe ve tê vegotin. Xwîner, di naveroka pirtûkê de rastî jiyana gundiyan, ajelên cur bi cur, tecrûbeyên xwezayê, fêrbûna xweza û rûdanên wê, bi vî awayî xetereyên li ser xweza û hişmendiya wê û bi taybet koça leglegan a bêpergal tên.

**5.1. Bihevrebûn û Yekbûna Xweza û Hawirdorê**

Di pirtûka *Dara Pîroz* de wekî hevdîtineke destpêkî, serleheng Zerya û Dara Pîroz li gorî honakê digihîjin hevûdu. Zerya di xewa xwe de xewnekê dibîne û ev yek dibe rêhavaltiyeke honakî. Ji ber ku di xewna xwe de li pey dermanê xwe ye û li navnîşana xwe ya dermanê digere. Ewil diçe nav baxçeyekî mişmişan, li ber dareke ciwan radiweste

û bi wê re pirsa dermanê xwe dike. Dara ciwan jî ji bo dermanê wê, berê serlehengê dide Dara Pîroz. Ev vegotin û honak, dikare wekî bihevrebûn û yekbûna xweza û hawirdorê ji bo xwîneran bê têgihiştin:

> "Mişmişên min ji te re nabin derman. Lê li ser wî girê jor, dareke mezin heye. Ew dareke gelekî hêja ye. A baş, tu here ser gir û derdê xwe ji wê Dara Pîroz re bibêje" (r. 14).

Di pirtûka *Dara Pîroz* de xalê serlehengê mişmişan peyda dike da ku bide xwarziya xwe. Li pey Dara Pîroz dikeve û jê re fêkiyên wê tîne. Ji bo vê yekê Zerya û malbata xwe piştî xweşbûna Zeryayê diçin gundê xalê xwe û li wê derê digel hin serpêhatiyan dikevin pey Dara Pîroz bo ku wê bibînin. Gund û derdora gundê xalê wê ji aliyê jiyana kevneşopî ve ku di nav xwezayeke dest lê neketî de ye gelekî balê dikişîne. Ji ber ku tevî xalê wê û keça wî di nav gund û derdora gund de jiyaneke xweşik û bitendurîst li ber çavên xwîneran tê raxistin. Ev yek dikare wekî bûna di nav xwezayê de bê nîşandan û bi wî awayî yekbûn bê dîtin:

> "Zeryayê bi dayîka xwe re, amedakariya xwe kirin û çûn mala xalê xwe. Bi rê de gelek çem û çiya hebûn. Mirov di nav zeviyan de dixebitîn. Kariyên pez li kêleka rê diçeriyan. Kêfa Zeryayê ji jiyana gundewar re gelek hatibû. Jiyana bajêr û gund, di hişê xwe de dida ber hev û ji dayika xwe pirsan dikir" (r. 24).

> "... Şîlan bi destê Zeryayê girt û bi hev re derketin derve. Gundê xalê wê gelekî xweş bû. Gelek kaniyên zelal û baxçeyên bifêkî hebûn. Ne bi tenê kanî û baxçe, kîjan ciyê xweş hebûya, bi hev re diçûn lê digeriyan. Piştî westiyan, Şîlan û Zerya vegeriyan malê" (r. 25).

Bihevrebûna xweza û kesayetên gundî û wekî mêvan serlehenga Zeryayê li ser giyanên wan hestiyariyên erênî dihêle. Ev yek di têkiliya xweza û mirovan de wekî temamkereke binyadî ye:

> "Zeryayê bi Şîlan re hevaltiyeke xweş dikir. Bi hev re diçûn ser kaniya gund. Keç û jinên gund, bi satilan av dikişandin malê. Zerya û Şîlan jî bi satilên piçûk tevli vî karî bûn. Carek jî gava pez hatibû nêzî gund, her du bi hev re çûn nav pezî." (r. 26).

Di pirtûka *Warê Leglagan* de jî xweza di nav jiyana gundiyan de ye. Bihevrebûn û yekbûn di hemû rûpelan de balê dikişîne. Herçiqas serlehenga pirtûkê Berfîn û malbata wê li bajarê Amedê bijîn jî fikr û hestên wan li ser xwezayê ne û hertim qala gund û xweşikbûna wî dikin. Dema betlaneyê diçin û tevlî jiyana xwezayî dibin yan jî jiyana bi vî awayî wekî çavdêr vedibêjin:

> "Hin rojan jî em bi bavê xwe û kale xwe re diçûne birîna çilo. Bi rastî jî mirovên vî gundî, ne mîna moriyan lê ji moriyan jêhatîtir bûn. Di dawiya biharê de, berî sir û bayê payîzî mîna xezebê bê û pelên daran zer bike û dûre jî biweşîne, çilo dibirin" (r. 15).

Li ser van tesbîtan dikare bê gotin ku ev herdu pirtûk jî ji aliyê bihevrebûn û yekbûna xweza û hawirdorê ve dişibin hevûdu. Serleheng û karaktarên wan hertim bi xwezayê re ne û di navbera wan de têkiliyeke xurt heye.

### 5.2. Naskirin, Hayjêhebûn û Kifşkirina Xweza û Hawirdorê

Di pirtûka *Dara Pîroz* de hin çavdêrî, dikarin wekî naskirin û hayjêhebûna hawirdorê bên xwendin. Serleheng bi vî awayî xwezaya xweşik nas dike û haya ji wê xurt dibe:

> "Dîmen gelekî xweş bû. Zeryayê li çiyayên bilind, geliyên kûr û dar û beren derdorê temaşa dikir. Di temenê xwe de, cara pêşîn bû ku ciyekî ewqas xweş didît. Xalê wî bi destê wê girt, bi hev re çûn ser Kaniya Spî. Bi vexwarina ava Kaniya Spî re westa xwe ji bîr kir. Ava kaniyê bi nazdarî diherikî. …
>
> Dara mişmişê gelek mezin û xweşik bû. Bilindbûna wê qasî xaniyekê duqat bû. Bi firehiya xwe jî derdora xwe tijî kiribû. Weke konekî bi ser stûna xwe ve xwar bibe, pel û şaxên wê, bi ser qurmê wê ve xwar bûbûn. Pelên di bin tava havînê de dibiriqîn, li ber bayê çiyÊ hinohino dilerizîn" (rr. 26-27).

Naskirin pir caran digel kifşkirinê derdikeve holê. Ji ber vê yekê pirs, mereq, lêkolîn û berawirdekirin ji aliyê geşedena zarokan ve karînên sûdwergir in. Serlehenga *Dara Pîroz* hin caran bi vî awayî tevdigere:

> "Kêfa Zeryayê ji jiyana gundewar re gelek hatibû. Jiyana bajêr û gund, di hişê xwe de dida ber hev û ji dayika xwe pirsan dikir" (r. 24).

Pirtûka *Warê Leglagan* jî di hin cihan de naskirina xwezayê dihewîne û ev hem wekî balkişandinê hem jî wekî kifşkirinê tê dîtin:

> "Hêlîn (Gundekî di romanê de derbas dibe), mîna navê xwe hêlîneke firindeyan ku hêlîna xwe di nav zinar û baniyan de çêdikin, li nav çiyayên bilind bû. Derûdora hêlîna firindeyan kevir û lat be jî hundirê hêlînê weke hevrîşimê nerm û germ û xweş e. Gundê bapîran Hêlîn jî wisa ye" (rr. 4-5).

Qîmeta xwezayê di pirtûka *Warê Leglagan* de bi devê mamosteya zanistên fenê tê veguhestin. Ev wekî peyameke rasterast be jî wekî hevokeke estetîk bi devê karekterekî tê gotin û xwezayê dide nasandin:

> " Xweza, ax dayika me zindiyan e, çi mirov, çi ajel û çi giya; em tev memika xwezayê şîr dimijin" (r. 46).

Naskirina xwezayê bi hesta mereqê ve bi rêya serlehenga pirtûka *Warê Leglegan* tê pêşkeşkirin. Jiyana leglegan bala serlehengê dikişîne û ew mereq dike bê ka çima koça wan bêpergal dibe. Ev yek kifşkirineke giring e ku bi saya wekhevîbûnê ve berê xwîneran dide pirsan:

> "Ev legleg çima wisa zû vegeriyabûn gelo. Tiştê me dîtîbû dihate çi wateyê" (r. 48).

Ev herdu pirtûk, li derdora serlehengan, digel hin diyalog, rûdan û pêkhatinan; naskirin, hayjêhebûn û kifşkirina xweza û hawirdorê dikin. Li gorî vê yekê kiryarên wekî kifşkirin, pirskirin û hwd. bi awayekî hevpar di pirtûkan de bi cih in.

### 5.3. Naskirin, Hayjêhebûn û Kifşkirina Ajelan Di nav Xweza û Hawirdorê de

Ajel jî wekî jîndaran, beşdarên xweza û hawirdorê ne. Ji ber vê yekê naskirin û hayjêhebûna wan jî di nav jiyaneke xwezayî tê hesibandin. Di pirtûka *Dara Pîroz* de jiyana gundewaran digel hin ajelên ku tên xwedîkirin hatiye pêşkeşkirin. Serleheng jî wan di nav jiyaneke xwezayî de nas dike:

> "Carek jî gava pez hatibû nêzî gund, her du bi hev re çûn nav pezî. Kêfa Zeryayê herî zêde ji bizinan re hatibû, digot qiloçên wan gelekî xweşik in" (r. 26).

Di pirtûka *Dara Pîroz* de ajelên din ên xwezayî jî derbas dibin. Ev jî dîsa bi navbeynkariya pirtûkê ve tên pêşkeşkirin:

> "Weke ku di xewna xwe de dîtibû dengê çîveçîve gelek çukan ji ser darê dihat. Û sihorîkên piçûk û mezin li ser şaxan bi çirvîtik û lotik, bi kêf û henek dilîstin" (r. 28).

Di pirtûka *Dara Pîroz* de ajeleke ya malê jî heye. Ev, pisîka Zeryayê ya bi navê Rindê ye. Ev jî bi rêya hezkirin û xwedîkirinê ve dikare ji bo dilovaniya ji ajelan re bê nîşandan:

> "Di nav demên nexweşiyê de yekana hevala wê Rindê bû. Jixwe gava Zeryayê li mal bûya Rindê jê nediqetiya. Rindê hema weke giloka berfê bû, yeka gelekî nermîn û nazenîn bû. Çavekî wê şîn, yê din jî zer bû" (r. 5).

Pirtûka *Warê Leglegan* jî rewşa ajelan di nav xweza û jiyana gundiyan de wekî mînak dihewîne. Di navbera ajel û merivan de têkiliyeke xurt heye:

> " – Dayê berî bibe betlane em biçin Hêlîn, ez dixwazim çîçîkên mirişkan hê ku pir piçûk in bibinim, karik û berxik jî gava mezin dibin bi min re nalîzîn" (r. 5)

> "Min bêriya sewalan, kere gewr, çêleka zer, bizina çal, psîka sêrek dikir û saye hogir yê ku em biçûna kû derê ji dû me nediqetiya" (r. 18).

Di *Warê Leglagan* de ajelên din ên xwezayî bi cih in. Ev jî wekî nasandina wan deweran hatine bikaranîn:

> "Pasûr ji Amedê bilindtir e loma hê giyayê vir zer nebûye. Hûn ê niha bibînin Hêlîn ji Pasûrê bêhtir hêşîn e. Heke Pasûr Hêlîna kîvroşkan e, Hêlîn hêlîna baz û eyloyan e" (rr. 10-11).

Di pirtûka *Warê Leglagan* de di derheqê jiyana ajelan de agahî hene. Ev yek jiyana ajelan û qeydaya jiyanê ji xwîneran re nîşan dide:

> "- Bi destpêka demsala payîzî re, ango dema hewa dest pê kir hêdî hêdî sar dibe; hin ajel xwe vedikişînin hêlînên xwe qul û qeweran. Hin jî dest bi koça xwe ya demasalî dikin; ber bi warên germ ve difirin. Wisa ku ew rêwîtî bi roj û mehan didome" (r. 20).

Ji aliyê hewandina ajelan ve, dikare bê gotin ku ev herdu pirtûk dewlemend in. Ji ber ku di pirtûkên mînak de hem ajelên li derdora jiyanê hem jî yên derveyî wê bi hev re hatine bikaranîn. Xwînerên zarok, bi saya van bikaranînan di nav xweza û jiyanê de ajelên cur bi cur nas dikin.

### 5.4. Hezkirina Xweza û Hawirdorê

Serlehenga *Dara Pîroz* li pey wê darê ye ku dê jê re şifa bide. Loma têkiliyeke xurt û hestiyariyeke balkêş di navbera serleheng û Dara Pîroz de pêk tê. Serleheng, ji ber dîtina wê gelekî kêfxweş dibe û ev dar li ser rihê wê aramiyekê dihêle:

> "Weke ku ji xwe ve biçe, çavên xwe zîq vekirîbûn li wê Dara Pîroz temeşa dikir. Di dile xwe de got:
>
> 'Dara ku min di xewna xwe de dîtibû ev bû.' …
>
> Piştî ku bêhna xwe da, Zeryayê bi baldarî li Dara Pîroz mêze kir, bi hemû hezkirin û dilovaniya xwe, dest pê kir, bi dara mişmişê re peyivî:
>
> 'Dara mişmişên zer, dara mişmişên xudayî, ji te re çiqas spas bikim kêm dimîne. Te ez ji êş û janeke mezin xelas kirim. Te êşa zikê min baş kir. Bi xêra te ez ji nû ve derketim nav hevalên xwe, …" (rr. 27-28).

Di pirtûka *Dara Pîroz* de di navbera serleheng û pisîka wê de hezkirin û dilsoziyekê balê dikişîne:

> “Rindê wê çaxê têjikeke piçûk bûye. Zerya pir jê hez dike. Navê Rindê lê dike û wê xwedî dike. Rindê jî, wê weke xwedî û hevala xwe dibîne” (r. 5).

Di dawiya pirtûka *Dara Pîroz* de di navbera serleheng û xwezayê de bihevrebûn û hezkirin bi awayekî edebî tê zimên:

> “Bayekî hênik ji nav xwezayê bêhna gul û kulîlkan bi xwe re anî û hat rûyê wê alast” (r. 31).

Hezkirina xweza û hawirdorê di pirtûka *Warê Leglagan* de hestiyariyeke berpêş e. Herdu bira her tim qala gund dikin û dixwazin di nav xwazayê re xwe berdin. Ev hezkirin wekî mînak di nav honandina pirtûkê de xuya dibe:

> “Piştî taştê, Memî bavê min hembêz kir û mîna ku daxwaza wî nehatiye pejirandin û bi kelegorî, bi rik xwesteka xwe dubare bike, got:
>
> - Bavo, bavo me bibe nav zeviyan. Me bibe nav baxçeyan” (rr. 46-47).

Di pirtûka *Warê Leglagan* de jî hezkirina ajelan balê dikişîne. Hevala serlehengê Zozan, xwedî kûçikekî ye û ji wî dûr ketiye. Loma jî ev hezkirin û têkildarî tê zimên:

> “Tiştê herî pir bêriya wî dikir kûçikê wê yê bi navê Şiyar bû” (r. 23).

Ji ber ku hesta hezkirinê hem li ser diyalogên karakteran hem jî di tevgerên wan de xuya dike, hestiyariyeke xurt û berpêş a xwezayê dibe yek ji hevpariya van herdu pirtûkan.

**5.5. Hişmendiya Xweza û Hawirdorê**

*Dara Pîroz*, ji ber lêgerîna dermanê serlehenga xwe, hişmendiya xweza û hawirdorê dihewîne. Ev derman ji aliyê doktor ve wisa tê qalkirin ku di xwezayê de bi cih e û gelekî biqîmet e. Loma jî; ji ber sedema xerabbûna xwezayê her kes nikare bi hêsanî xwe bigihînê. Ev gotinên doktor, wekî têgihiştina/hişmendiya xwezayê ne:

> “Ez naxwazim dermanên tibbî bidim te. Mirov bi wan baş dibe; lê carinan xisarê jî didin canê mirov. Gava derman di nav xwezayê de hebe, ez zû bi zû dermanên kimyewî nadim kesekî. Siûda te heye, dermanê te jî nav xwezayê ye. Dermanê xwezayî bêxisar in û tedawiya herî baş dikin. Peydakirina dermanê te hem gelekî hêsan e, hem jî gelekî zor e. Bila bavê te here li sûkê bigere. Mişmişên bêderman û bêhormon peyda bike û bîne” (r. 9).

*Warê Leglagan*, ji aliyê perwerdeya hawirdorê ve xwedî gelek mînakan e. Ji ber ku qala dersa zanînên civakî pir tê kirin û di vê derse de yên ku fêr dikin di qada xwezayê de ne. Ev yek hişmendiya derbarê xweza û hawirdorê de xurttir dike. Ji aliyê din ve tê dîtin ku perwerdeya hawirdorê û bihevrebûna jiyanên merivan wekî şiyana sentez şikl werdigire:

> “Vegotina mamosteyî, mîna ku ez ji xewê şiyar kiribim, ez veciniqandim. Bi vegotina mamosteyî ya li ser koçberiya firindeyan, hişê min î ku Zozanê di nav şanayên xwe de veşartibû, bi gotinên mamosteyê Waneya Zanînên Civakî re hevala winda anîbû ber çavên min” (r. 31).

> “- Mamosteyê min, ew ajelên ku hûn dibêjin, dê bi destpêka biharê re vegerin welatê me, hin ji wan qet neçûne cihekî dî heta ku dîsa vegerin” (r. 63).

*Warê Leglegan*, jiyana xwezayî û ya bajarî wekî berawirdekê ji me re pêşkeş dike. Ev herdu jiyan li gorî vebêj, bi cudabûn û qîmeta xwe şênber dibin:

> "Mala di nav çar dîwarên hişk de ku tenê mastereya xwezayê çend kulîlkên di guldankê de bûn. Piştî gera li nav gelî û çiyayên bi berfê nixumandî, deşta fireh, baxçeyên fêkî û zerzewatên, em dîsa hatibûn jiyana ji betonê" (r. 57).

Ji ber ku di herdu pirtûkan de bi navbeynkariya serleheng û hin karakteran têgihiştina/hişmendiya xwezayê pêda pêda dikemile û serleheng bi vî awayî xwezayê û rewşên wê nas dikin, sêwirandina herdu pirtûkan ji aliyekî ve dişibin hevûdu. Helbet yek çîroka biwêne ye yek jî roman e. Lê serpêhatî û hişmendiyên ku pêk tên dikare bi bergeheke hevpar bê diyarkirin.

### 5.6. Zanîna Feydeyên Xweza û Hawirdorê

Feydeyên xweza û hawirdorê, di pirtûka *Dara Pîroz* de li ser feydeya fêkiyan, qatixên gundiyan û hwd. diyar e. Ev yek feydeya xwezayê nîşan dide:

> "Kîjan xwarina xweş hebûya ji wan re amade kiribûn. Kêfa Zeryayê herî zêde ji nane sêlê u mastê miyan re tatibû. Hinek hingivê keweran û hinek mast dida ser nanê xwe û bi gepan lê dijidand" (r. 26).

Pirtûka *Warê Leglagan* gelek feydayên xwezayê dihewîne. Ji ber ku gundî, debara xwe li ser xwezayê dike. Bi vî awayî xweza, wargeheke biqîmet e:

> "Ji axê bêhtir kevir û lat in loma jî çandiniya ce, genim û nîskan ne pêkan e yan kêm e. Lê ji bilî darên fêkiyan, her malbat bênderek pîvaz û tûtin bi dest dixe. Ji fekiyan hermê, tû, hejîr, hinar, xox, mişmiş, biyoki incas, bêhîv û gûz neqşê van çiyan in" (r. 11).

Zanîna feydeyên xweza û hawirdorê dikare di çarçoveya têgihiştina/hişmendiya xwezayê de bê bicihkirin. Zarok bi van agahiyan digihîjin feyde û derfetên xwezayê. Yek ji hevpariyan van pirtûkan jî ev e.

### 5.7. Zanîna Dijwariya Xweza û Hawirdorê

Di pirtûka *Dara Pîroz* de dijwariya xwezayê derbas dibe. Herçiqas xweza wekî xwedî derman bê nîşandan jî ev yek ewqas hêsan nîne. Ji ber ku xwegihaştina Dara Pîroz ked û hewldanekê dixwaze ku meriv bigihîjê û xweş bibe:

> "Li quntara çiyê, di dawiya Geliyê Kûr de, nêzî Kaniya Spî dareke mişmişê heye; lê rêya kesî pê nakeve. Ez ji bo xatirê Zera delal, di şefaqê de rabûm. Sibe zû bi rê ketim; lê rê gelekî dûr bû" (r. 19).

*Warê Leglegan*, digel feyde û xweşikbûna xwezayê hin dijwariyên xwezayê jî dihewîne. Bi vî awayî xweza û hawirdor tê zanîn:

> "Çûkên koçber, koça mirovan, şert û mercên dijwar, cih û warên guncav, çerx, dubare… Û herî pir jî veger!!!" (r. 31).

> "Bi barîna berfê re ez birayê xwe kêfxweş bûn lê dê û bav û bapîr ne di heman destê de bûn. Dêya min digot:
>
> - Rê bêne girtin, em ê nikarin biçin gundê dapîran.
>
> Bavo digot:
>
> - Ku pir bibare zû venakin rê.
>
> Bapîran digot:

- Xwedê bike pir nebare ku pir dirêj bike berf, ne êm têrî pez dike ne jî çiloyê cêziyan" (r. 39).

Ji ber ku digel feyde û derfetên xwezayê divê sextî û hin rastiyên wê jî bên nîşandan, dijwariya xwezayê jî di van pirtûkan de derbas dibin. Bi çend mînakan be jî ev yek giring e ku ev herdu pirtûk xwezayê bi vê rolê jî didin nasandin.

### 5.8. Xetereyên li Ser Xweza û Hawirdorê

Feydeya xwezayê ya tendurîstiyê di pirtûka *Dara Pîroz* de di hin cihan de derbas dibe. Mînakek heye ku di xewna serlehengê de bi axaftina dareke ciwan tê pêşkeşkirin. Ev mînak xetereyên li ser xwezayê nîşan dide:

> "Li ber dareke ciwan sekinî û jê re daxwaz kir ku mişmişên bêderman û bêhormon bide wê. Dara ciwan bi xemgînî bersiv dayê:
>
> 'Min gelek dixwest, mişmişên min ji bo êşa te bibin derman û em bi hev re bibin heval. Lê salê dû caran tên derman davêjin ser fêkiyên me û biharê jî dermanek bera ber koka me didin. Fêkiyên me êdî ne xwezayî ne, qasî fedaya wan heye, ewqas jî xisara wan heye" (rr. 13-14).

Di pirtûka *Dara Pîroz* de dikandar jî ji bavê Zeryayê re di wexta lêgerîna dermanê keça wî de rewşa bêtendurustî û xetereyên li ser fêkiyan dibêjin:

> "Belasebeb negere, li van deran êdî mişmişên bêderman û bêhormon nemane. Dibe ku li gundên di nav çiyayan de, dareke mişmişê mabe ku hîn derman û hormonan bandora xwe lê nekiribe" (r. 18).

Di pirtûka *Dara Pîroz* de cihekî din jî bi axaftina Dara Pîroz heman xetereyê nîşan dide:

> "Helbet min dixwest hemû dar li ser eslê xwe bimînin; lê mirovên neqenc, ji bo qezanca zêde, dixwazin reng û tahma fêkiyên me biguherînin. Dixwazin bi dermanan fêkiyeke nû çekin" (r. 15).

Xetereyên ku li pêşiya xwezayê ne di pirtûka *Warê Leglagan* de ji tên bikaranîn. Bal bêtir li ser guherîna avûhewayê ye. Sedemên ku ji mirovan pêk tên bandoreke neyînî li ser xweza û hawirdorê dihêlin:

> "- Rast e. Îro, li gelek deverên cîhanê pirsgirêka mezin xerabûna xwezayê, guherîna kişwerê ye. Mixabin mirov bi destê xwe, bivir li gûzeka xwe dixin. Em bi her awayî dahatûya xwe dikin dojeh" (r. 32).

Xetereyeke giring ew e ku koça leglegan digel bêpergaliyê tê nîşandan. Loma navê pirtûkê jî *Warê Leglegan* e da ku ev xeter bê famkirin:

> "- Duh, ez û zarok bîstekê li nav zeviyan geriyan. Me zêdeyî deh heban legleg jimartin, di ser gund re derbas bûn, ber bi hêla bakur ve firîn. Cotecot ji hev qetiyan û ber bi hêlînên xwe ve çûn" (r. 49).
>
> "Lê çawa? Zivistan û legleg! Ma qey ji roja roj ve, legleg payîzî ji vir koç nakin û ku dibe bihar jî dîsa venagerin?!" (r. 50).
>
> "Ne tenê îsal, ev şeş sal in komek legleg nema koç dikin. Sal çar demsal ji cihê xwe nalivin" (r. 64).

Xetereyên ku xweza tê de ye digel bavê serlehengê wekî hin peyaman xwe nîşan dide:

> “- Ku mirov wisa bi xwezayê re xiniziyê bikin, dev ji koça ajelan berde; dê rojek bê, ne av dimîne, ne giya û ne jî ajel. Mirov vê demê, bi aqilê xwe yî ji her demê zêdetir, gora xwe, bi destê xwe dikole” (r. 55).

Di herdu pirtûkan de jî xetereyên li ser xweza û hawirdorê hatine nîşandan. Xerabbûna xwezayê, fêkiyan û hwd. derbas dibin ku ev yek wekî rexnekirina meriv û civakê ye ku ji destên wan tên. Herdu pirtûk jî li ser vê yekê radiwestin.

**5.9. Parastin, Tevger û Peyankerî ji bo Xweza û Hawirdorê**

Peyamên ku di nav berhemên edebiyata zarokan de cih werdigirin divê tenê di asta agahiyan de nemînin û zarokan teşwîqî beşdarbûna çalakiyê jî bikin û bi vî awayî wan ji aliye parastina pirsgirêkên hawirdorê ve aktîf bikin (Teke & Baş, 2021, r. 138). Özdemir û Gökçe, di xebata xwe de tesbît kirine ku kitêba dersa Sosyal Bilgilerê ya ku nirxandine, ji aliyê perwerdeya hawirdorê ve xwedî agahî û naverok in lê ji aliyê tevger û çalakiyên bi vî şiklî kêmasiyên wê hene (2019, r. 72). Ji ber ku serlehengên pirtûkên mînak bi pêwendî hesta wekhevîbûne hewl didin ku ev hişmendî çêbibe, herdu pirtûkên mînak li gorî van tesbîtan dikarin bên nirxandin.

Serlehanga pirtûka *Dara Pîroz*, di nav hestiyariya dilsoziyê de ye. Ev dilsozî bi awayekî dadigere hişmendiya hawirdorê û dibe amanceke ji bo siberojê. Ji aliyê din ve ev fikra hişmendiya hawirdorê berê serlehengê dide tevgerekê. Ev yek jî ji zarokan re karîna peyankeriyê dibexşîne:

> “… Xwezî min jî ji bo te tiştek bikira. Xwezî qenciyeke min jî bigihîşta te.
>
> Bi gotinan dilê wê rehet nebû. Çû ji Kaniya Spî kulm bi kulm av anî li ber koka darê kir. Di wê navberê de, di hişê wê de, fikrek wekî brûskê çû û hat. Zeryayê xwe bi xwe got:
>
> ‘Erê, Erê, ev fikrekî gelekî baş e. Ez ê tovê vê dara mişmişê hêdî hêdî li hemû cîhanê belav bikim. …
>
> ‘Ez ê her dendikekê, bikim darek. Bila tovên dara mişmişê pîroz, li hemû cîhanê belav bibin” (rr. 28-29).

Dara Pîroz, di xewna serlehengê de diaxive û bi wêrektiya xwe tevgerên rast nîşan dide ji xwîneran re.

> “Gelek dar vê neqenciyê qebûl kirin û ji eslê xwe bi dûr ketin. Lê min ev qebûl nekir. Niha ez bi vê rewş û helwesta xwe gelekî serbilind im” (r. 15).

Pirtûka *Warê Leglegan* jî xwînerên xwe bervî tevger û şiyana peyankeriyê dike. Ev hewl, wekî berîdaniyekê ji bo perwerdeya hawirdorê û hişmendiya xwezayê biqîmet e:

> “- Dibînim ku ev mijar pir bala te dikişîne. Ji bo pirsên di serê te de zelal bibin, sibe em biçin navçeyê. Hevalekî min heye li wê derê. Ew, ligel çend hevalên xwe, komeleyeke hunerî ava kirine û her weha li ser tevger û hebûna ajel û giyayên endemîk lêkolînê dikin” (r. 48).

Edebiyata zarokan ku di çarçoveya ekopedagojiyê de cih digire, dikare zarokên ji çaraliyên dinyayê ji bo berxwedana li hemberî pêkhatinên xerab ên çandî û xwezayê amade bike (Gaard, 2008, r. 21). Bi vî rengî di pirtûka *Warê Leglegan* de ji bo parastina xwezayê serleheng di nav tevger û peyankeriyê de ye û li çareseriyê digere. Mamosteya wê jî pişt dide û bi hev re tevlî xwendekaran qîret dikin ku ev rewş bê dîtin û famkirin:

> "Divê ez pêşniyazên we ragihînim gerînendeya dibistanê. Divê ew jî ji gerînendeya perwerdehiyê û her weha qeymeqamê navçeyê destur wergirin. Ji me re otobusek jî divê. Ku min hemû pirsgirêk çareser kirin, ez ê agahiyê bidim we" (rr. 64-65).

Herdu pirtûk jî parastina xweza û hawirdorê û di wî rêyê de peyankeriyê dihewînin. Serlehengên pirtûkên mînak bi saya serborî, çavderî û hwd. dibin xwedî hişmendiyekê. Pişt re dixwazin ku ji bo ewleyiya xwezayê bibin peyanker. Ev jî mînakeke hevpar e. Ji aliyê edebiyata zarokan ve pirsgirêk ku digel çareseriyê pêk bê watedar e. Eger wisa nebe meriv dikare bibêje ku honak sist e.

**5.10. Bi Pêwendî Ekorexneyê Têkiliya Xweza û Rewşa Mexdûr û Yên Din**

Meriv û civat, daxilî xwezayê ye. Xweza bi vî rengî di hişên kesan de tenê bi awayekî siruştî namîne. Ji ber sedemên cur bi cur, hin meriv û civat di nav tengasiyê de gelekî êş kişandine. Loma koç, sirgûn û rûdanên bi vî awayî jî xwezaya mirovayetiyê xera dikin. Arıkan dibêje ku ekorexne di heman demê de pênaseya çandên niştecih û zimanan jî dike ku em îro ji rewşa wan agahdar dibin. Vekoler wekî mînak berhemên Mıgırdiç Margosyan dide û bi navbeynkariya wan qala agahdarbûna saziya civata Ermen û Xiristiyanan dike (2011, r. 49). Bi vî awayî dikare bê gotin ku teoriya ekorexneyê di navbera xweza û mirovayetiyê de xwedî nêrîneke berfireh e. Di pirtûka *Warê Leglegan* de serleheng, digel gera xweza û deverên cur bi cur qala pirçandiyê jî dike. Ev yek dikare bi têkiliya ekorexneyê re bê girêdan:

> "Par havînî em çûbûn başûrê Amed, em li Bajarê Mêrdîn û Êlihê seranser geriyabûn. … Dêrên suryaniyan, mabedên êzidiyan, mizgeftên misilmanan; weke sifreyeke dewlemend, weke hîzareke bi rengên cuda neqşkirîbûn. ….
>
> - Huner û hostatiya ji hezar salan hatî, nifş bi nifş geş dibe û dom dike lê mixabin suryaniyên xwediyê vê hunera xweşik koçî welatên dûr kirin, pir pir hindik mane li se warê xwe û xetereya windabûna vê hunerê, niha ji her demê bêhtir e" (r. 8-9).

Bi pêwendî ekorexneyê rewşa mexdûr û yên din, di pirtûka *Dara Pîroz* de tune ye. Ev yek cudahiya van pirtûkên mînak e. Ya rastî ev mînaka ku di pirtûka *Warê Leglegan* de derbas dibe bi awayekî taybet hatiye bikaranîn. Meriv dikare vê mînakê bi têkiliya mijara çandê û bi cureya romanê binirxîne. Ji ber ku çîrok cureyeke kurt e û nehewce ye ku ev yek wekî kêmasiyekê bê dîtin.

**Encam**

Di vê xebatê de du pirtûkên kurdî yên ji bo zarokan di çarçoveya ekorexne û perwerdeya hawirdorê de hatine nirxandin. Pirtûkên mînak, berhema Berfin Ayşe Öğüt a bi navê *Dara Pîroz* û ya Îsmaîl Dîndar a bi navê *Warê Leglegan* in. Ev pirtûk, li gorî hewandina hezkirin, têgihiştin/hişmendî û parastina xweza û hawirdorê û bi pêwendî van hêmanan li ser naverokên xwe hatine analîzkirin. Hatiye dîtin ku temayên van herdu pirtûkan li ser hezkirin, têgihiştin/hişmendî û parastina xweza û hawirdorê ne û bi vî awayî li gorî teoriya ekorexne û perwerdeya hawirdorê xwedî naverok in. Bi vî rengî ji bo xwîneran hest û fikrên hezkirin û hişmendiya xweza û hawirdorê, tevger û peyankeriya wê hatine amanckirin. Serpêhatiya pirtûka *Dara Pîroz* li ser nexweşiya serlehenga pirtûkê û dermanbûna xwezayê derbas dibe. Pirtûka duyem, *Warê Leglegan* jî di nav gund û xwezayê û deverên wê de li ser serpêhatiya xwişk û birayekî ye. Herdu pirtûk, bi devê serlehengên xwe digel şert û mercên xweza û hawirdorê, xweşikbûna wê, jiyana xwezayî ya gundî û ajelên malê û yên derveyî, hin xetereyên ku di nav xweza û hawirdorê de fêkî û ajelan tehdît dikin û bi vî awayî ji bo jiyana merivan jî neyîniyan derdixîne hatine honandin.

Li gorî destkeftiyan herdu pirtûk jî di van hêmanan de xwedî neverok in û ev yek hem ji aliyê amancên teoriya ekorexneyê hem jî ji aliyê perwerdeya hawirdorê ve li hev tên. Di pirtûkên mînak de di çarçoveya têkiliya xweza, hawirdor û edebiyata zarokan de û bi pêwendiya ekorexne û perwerdeya hawirdorê ve hin hêman hatine tesbîtkirin. Loma hate dîtin ku serleheng û serpêhatiyên pirtûkan di çarçoveya bihevrebûn û yekbûna xweza û hawirdorê de ne. Naskirin, hayjêhebûn û kifşkirina xweza, hawirdor û ajelan jî di pirtûkan de derbas dibin. Hezkirina xweza, hawirdor û ajelan têra xwe hatiye bikaranîn. Peyamên rasterast û yên vêşartî yên wekî hişmendiya xweza û hawirdorê tên dîtin. Zanîna feyde û dijwariya xweza û hawirdorê jî di nav pirtûkan de balê dikişînin. Xetereyên li ser xweza û hawirdorê di pirtûkan de berpêş in û ji bo bergirtin û çareseriya van xalan serleheng û karakterên pirtûkê livdar in. Parastin, tevger û peyankerî ji bo xweza û hawirdorê tên kirin û bi pêwendî ekorexneyê têkiliya xweza û rewşa wekî kesên mexdûr û yên din jî tê dîtin. Bi vî awayî dikare bê gotin ku pirtûkên mînak ji bo hezkirin, têgihiştin/hişmendî û parastina xweza û hawirdorê li ser zarokan bibandor in. Loma jî prensîbên teoriya ekorexne û perwerdeya hawirdorê û taybetiyên pirtûkên mînak, wekî ku di xebatên lîteratûre de jî hatiye nîşandan hinkûfê hevûdu ne.

Di dawîya xebatê de li gorî destkeftî û encaman em dikarin van pêşniyaran bikin: Xebatên cur bi cur ên li ser têkiliya xweza, hawirdor û edebiyata zarokan, di fokûsa berhemên din de dikare bên kirin ku destkeftiyên cuda bên bidestxistin. Ev xebat, ji bo hezkirin, têgihiştin/hişmendî û parastina xweza û hawirdorê dikare ji malbat, berpirsiyariyên perwerdeyê û pisporan re bibe rênişandanek. Destkeftî û encamên vê xebatê dikarin di pirtûkên derse de ji bo hilbijartina metnên ku tema û mijarên van li ser xweza û hawirdorê ne pêşniyariyê bikin.

**Jêder**

Akçay, İ. (2006). Farklı Ülkelerde Okul Öncesi Öğrencilerine Yönelik Çevre Eğitimi. Lîsansa Bilin a Neçapbûyî. *Uludağ Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.*

Arıkan, A. (2011). Edebî Metin Çözümlemesi ve Ekoeleştiri. *Akdeniz İnsani Bilimler Dergisi*, 1(1), 43-51.

Bahar, M. & Kiras, B. (2017). Türkiye'de Yayımlanan Çevre Eğitimi Konulu Makale ve Tezlerin Genel Analizi. *Abant İzzet Baysal Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, 17 (4), 1702-1720.

Bulut, F. (2020). Ekoeleştiri Kuramı Işığında Ayla Kutlu'nun "Huvava: İlk Çevre Koruyucu" Adlı Eserine Bakış. *Turkish Studies-Language*, 15(2), 625-638. https://dx.doi.org/10.29228/TurkishStudies.41650

Bulut Sarıkaya, D. (2005). Çevre ve Edebiyat: Yeni Bir Yazın Kuramı Olarak Ekoeleştiri. *Littera*, 17, 79–86.

Dîndar, İ. (2020). *Warê Leglegan*. Amed: Weşanxaneya Morî.

Erten, S. (2004), Çevre Eğitimi ve Çevre Bilinci Nedir, Çevre Eğitimi Nasıl Olmalıdır?, *Çevre ve İnsan Dergisi* (Çevre ve Orman Bakanlığı Yayın Organı). 65/66, 1-13.

Gaard, G. (2008). Toward an Ecopedagogy of Children's Environmental Literature, *Green Theory & Praxis: The Journal of Ecopedagogy*, 4 (2), 11-23.

Gülersoy, A. E., Dülger, İ., Dursun, E., Ay, D. & Duyal, D. (2020). Nasıl Bir Çevre Eğitimi? Çağdaş Yaklaşımlar Çerçevesinde Bazı Öneriler. *Turkish Studies*, 15(5), 2357-2398. https://dx.doi.org/10.7827/TurkishStudies.44074

Ismail, H. M. (2024). Ecocriticism and Children's Literature: Dr. Seuss's The Lorax as an Example, *World Journal of English Language*, 14(3), 139-139.

Kiziroğlu, İ (2023) Çevre Eğitimi ve Çevre Bilinci. *Tabiat ve İnsan*, 2(193), 5-17.

Mamur, N. (2017). Ekolojik Sanat: Çevre Eğitimi ile Sanatın Kesişme Noktası. *Mersin Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, 13(3), 1000-1016. https://doi.org/10.17860/mersinefd.316297

Massey G. & Bradford, C. (2011). Children As Ecocitizens: Ecocriticism and Environmental Texts. Kerry Mallan and Clare Bradford (Ed.), *Contemporary Children's Literature and Film Engaging with Theory* (r. 109-126) dnd. London: Palgrave Macmillan.

Mishra S. K. (2016). Ecocriticism in Children's Literature: An Analysis of Amit Garg's Two Tales, *Galaxy: An International Multidisciplinary Research Journal*, 5(5), 91-96.

Oppermann, S. (1999). Ecocriticism: Natural World in the Literary Viewfinder. *Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi*, 16(2), 29-46.

Öğüt, B. A. (2020). *Dara Pîroz* (Wênesaz: Bilal Karagöz). Amed: Weşanxaneya Morî.

Özdemir, O. (2007). Yeni Bir Çevre Eğitimi Perspektifi: Sürdürülebilir Gelişme Amaçlı Eğitim. *Eğitim ve Bilim*, 32(145), 23-39.

Özdemir, M., & Gökçe, N. (2019). 6. Sınıf Sosyal Bilgiler Ders Kitabının Çevre Eğitimi Açısından İncelenmesi. *Medeniyet Eğitim Araştırmaları Dergisi*, 3(1), 61-75.

Topal, G. (2025). Greg Garrard'ın Ekoeleştiri Teorisi Çerçevesinde Pom Poko Filmi Üzerine Bir Okuma. *Communicata* (30), 32-44. https://doi.org/10.32952/communicata.1706424

Şimşekli, Y. (2004). Çevre Bilincinin Geliştirilmesine Yönelik Çevre Eğitimi Etkinliklerine İlköğretim Okullarının Duyarlılığı. *Uludağ Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, 17(1), 83-92.

Teke, N. & Baş, T. (2021). Çevre ve Çocuk Edebiyatı. Fatma Alisinanoğlu (Ed.), *Çocuk*

*ve Çevre* (r. 135-158.) dnd. Enqere: Weşanxaneya İzge.

Tošić, J. (2006). Ecocriticism-Interdisciplinary Study of Literature and Environment, *Facta Universitatis- Series: Working and Living Environmental Protection*, 3(1). 43-50.

Yavuz, Y. (2019). Edebiyat ve Ekoeleştiri: Latife Tekin'in Manves City ve Sürüklenme Adlı Romanları. *Edebî Eleştiri Dergisi* (Eleştiri Kuramları Özel Sayısı), 3/3, 245-259. Doi: 10.31465/eeder.567368

Yazgünoğlu, K. C. (2024). Ekoeleştiri Nedir? Ekolojinin Aynasından Edebiyat Eleştirisine Bakmak. *Söylem Filoloji Dergisi* (Edebiyat Kuramları ve Eleştiri Özel Sayısı). 334-355. https://doi.org/10.29110/soylemdergi.1558360

Yücel, A. S. & Morgil, F. İ. (1999). Çevre Eğitiminin Geliştirilmesi. *Balıkesir Üniversitesi Fen Bilimleri Enstitüsü Dergisi*, 1(1), 76-89.

## Extended Abstract

The world and life constitute a shared domain for all living beings. Although humans often position themselves at the center of this domain, such centrality also entails significant responsibilities. As Yazgünoğlu (2024, p. 352) states, not only humankind but also nature and other forms of life have their own stories. Humans are subjects within this shared existence, yet they must maintain balance and harmony with all other beings. While humans actively participate in sustaining life, this very involvement also generates various problems. It is well established that many threats to the continuity of life originate from human actions.

According to Mamur (2017, p. 1001), in the 20th century modern society, economic systems, and developmentalist ideologies pushed the world into crisis, which in turn gave rise to environmental movements in the arts. Thus, concepts such as modernity, capitalism, colonialism, urbanization, hegemony, politics, gender, social class, and group identity have shaped the relationship between humans and their environment.

Within this relational context between humans, nature, and the environment, Eco-Criticism Theory and environmental education emerge as significant frameworks. Eco-criticism examines ecological and environmental symbols in literary works, drawing on disciplines such as biology and geology—and, more broadly, the social sciences—and incorporates the conceptual tools offered by these fields (Oppermann, 1999, p. 29). Environmental education, at its core, is an experiential and active learning process that involves discovery and creation through cognitive, affective, and psychomotor domains (Gülersoy et al., 2020, p. 2385). Within the literary domain, children's literature provides a space in which love for nature, environmental awareness, and the principles of environmental protection are articulated. Literature thus serves as an interdisciplinary pathway to environmental education (Kiziroğlu, 2023, p. 9). Children can develop environmental consciousness through the books they read and the activities they engage in as part of these educational experiences.

The aim of this study is to examine two Kurdish children's books through the lens of Eco-Criticism Theory and environmental education. The sample books are *Dara Pîroz* (The Blessed Tree) by Berfin Ayşe Öğüt and *Warê Leglegan* (The Land of Storks) by Îsmaîl Dîndar. The analysis focuses on themes such as love for and awareness of nature and the environment, environmental protection, and related sub-elements. The findings indicate that both books foreground themes of environmental love, awareness, and protection, and thus align with the principles of eco-criticism and environmental education.

*Dara Pîroz* narrates the story of a child whose illness is healed through nature's restorative power. *Warê Leglegan* centers on the adventures of two siblings within the village and natural environment. Both works are constructed from the perspectives of their young protagonists and portray various aspects of nature and the environment, including its beauty, rural and urban life, domestic and wild animals, and threats to natural resources such as fruits and wildlife, along with the resulting negative effects on human life. The analysis reveals that both books contain numerous elements consistent with the aims of eco-criticism and environmental education. The characters' lives are intertwined with nature and the environment. Processes of recognizing, noticing, and discovering natural elements are clearly depicted. Love for nature, the environment, and animals is strongly emphasized. Environmental awareness is conveyed both directly and indirectly. The books highlight the benefits as well as the difficulties associated with nature and the environment. Threats to ecological balance are foregrounded, and the characters are portrayed as active agents in preventing or resolving these issues. They protect nature, take initiative, and engage in environmentally responsible actions. In relation to eco-criticism, the themes of victimhood and marginalization are also addressed. In this regard, it can be argued that the selected books effectively cultivate in children a sense of environmental love, awareness, and responsibility. Consequently, the characteristics of eco-criticism and environmental education reflected in the sample books are consistent with the theoretical perspectives and approaches presented in the relevant literature.